

Neteweyên Yekbûyî
Konseya Ewlekarîyê

S/RES/1325 (2000)

Belavkirin.: Gelemerî
31 Cotmeh 2000
00-72018 (E)

Biryara 1325 (2000)

Ya ku Konseya Ewlekarîyê di civîna xwe ya 4213an di 31 Cotmeh 2000an de daye

Konseya Ewlekarîyê,

Biryarên xwe yên 1261 (1999) a 25 Tebax 1999an, 1265 (1999) a 17 Îlon 1999an, 1296 (2000) a 19 Nîsan 2000an û 1314 (2000) a 11 Tebax 2000an li gel beyanên eleqedar yên Serokê xwe *bibîr tîne*, û *her weha* beyana Serokê xwe ya bo çapemenîyê bi hênceta Roja Neteweyên Yekbûyî bo Mafên Jinan û Aştîya Navneteweyî (Roja Jinan a Navneteweyî) di 8 Adar 2000an de *bibîr tîne* (SC/6816),

Her weha lixwegirtinên Deklarasyona Pekîngê û Platforma Çalakîyan (A/52/231) li gel ewên di dokumenta encam a Rûniştina Taybetî ya bîst û sisêyan a Kombûna Gelemerî ya Neteweyên Yekbûyî bi navê “Jinên 2000an: Wekhevîya Cinsan, Avakirin û Aştî ji bo Sedsala Bîst û Yekan” (A/S-23/10/Rev.1), bi taybetî ewên bi jinan û nakokîya çekdarî têkildar *bibîr tîne*,

Armanç û prensîbên Peymana Neteweyên Yekbûyî û berpirsiyarîya sereke ya Konseya Ewlekarîyê li gora Peymana domandina aştî û ewlekarîya navneteweyî *bibîr tîne*,

Fikarê *tîne zimên* ku sîvîl, bi taybetî jin û zarok, pîranîya mezin a kesên ku bandûra xerab a nakokîya çekdarî lê bûye pêk tînin, ku penaber û kesên di nav welêt de ji cîh derxistî di nav de ne, û her ku diçe bêtir ji alîyê şervan û hêmanên çekdar ve tînin armanckirin, û wek encam bandûra vê li aştîya domdar û lihevkerîna *nas dike*,

Rola girîng a jinan di pêşlêgirtin û çareserîya nakokîyan û avakirina aştîyê de *careke din teyîd dike*, û li ser girîngîya bi wekhevî tevlebûna wan di hemû hewlên ji bo domandîna û pêşdebirina aştî û ewlekarîyê de, û pêwîstîya zêdekirina rola wan di biryar dayina li ser pêşlêgirtin û çareserîya nakokîyê de *radiweste*,

Her weha pêwîstîya bi giştî bicîhanîna qanûna mirovanî û mafên mirovan a navneteweyî ku mafên jinan û keçan di dema nakokîyan û piştî wê de diparêze *careke din teyîd dike*.

00-72018 (E)

S/RES/1325 (2000)

Li ser wê pêwîstîyê radiweste, ku hemû alî bicîh bikin ku programên paqijîya mayinan û haydarîya mayinan pêwîstîyên taybetî yên jin û keçan li pêş çav bigirin,

Pêwîstîya acil a tevlêkirina perspektîveke cinsan bo operasyonên domandina aşîyê *nas dike*, û bi vê re têkildar, Deklarasyona Windhoek û Plana Namîbya ya Tevgera Tevlêkirina Perspektîveke Cinsan di Operasyonên Piralî yên Piştevanîya Aşîyê *not dike* (S/2000/693),

Her weha girîngîya temîkirina di beyana Serokê xwe ya bo çapemenîyê di 8 Adar 2000an de ji bo perwerdeya taybetî bo hemû karmendên domandina aşîyê li ser parastin, pêwîstîyên taybetî û mafên mirovan ên jin û zarokan di rewşên nakokîyê de, *nas dike*,

Nas dike ku têgihaştina bandûra nakokîya çekdar li jin û keçan, amadekarîyên bi bandûr ên sazîyan bo garantîkirina parastin û bi giştî tevlêbûna wan bo pêvajoya aşîyê, dikane pareke xwe di domandin û pêşdebirina aşî û ewlekarîya navneteweyî de hebe,

Pêwîstîya xurtkirina dataya li ser bandûra nakokîya çekdar li jin û keçan *not dike*,

1. *Bi xurtî doz dike* ku Dewletên Endam di hemû mustewayên biryar dayinê di sazî û mekanîzmayên neteweyî, herêmî û navneteweyî yên pêşlêgirtin, birêvebirin û çareserîya nakokîyê de zêdekirina nûnertîya jinan bicîh bikin;
2. Sekreterê Giştî *teşwîk dike* ku plana xwe ya stratejîk a çalakîyê (A/49/587) ku banga zêdekirina tevlêbûna jinan bo mustewayên biryar dayinê di çareserîya nakokîyê û pêvajoya aşîyê de dike, bicîh bîne;
3. *Bi xurtî doz dike* ku Sekreterê Giştî bêtir jinan wek nûner û şandîyên taybetî tayîn bike ku ofîsên baş li ser navê wî bişopînin, û bi vê re têkildar, *bang* dike ku Dewletên Endam namzedan pêşkêşî Sekreterê Giştî bikin ku tev li lîsta navan a navendî ku bi rêzdarî nûjen dibe, bibin;
4. *Dîsa bi xurtî doz dike* ku Sekreterê Giştî hewl bide ku rol û tevlêbûna jinan di operasyonên sehayî yên Neteweyên Yekbûyî de, û bi taybetî di nav çavdêrên leşkerî, polisên sîvîl, karmendên mafên mirovan û mirovanîyê de fireh bike;
5. Xwestina xwe ya tevlêkirina perspektîveke cinsan bo operasyonên domandina aşîyê *tîne zimên*, û *bi xurtî doz dike* ku Sekreterê Giştî bicîh bike ku li cîhê minasib, hêmaneke cinsan di nav operasyonên sehayî de hebe;
6. *Daxwaz dike* ku Sekreterê Giştî rêberî û materyalên li ser parastin, maf û pêwîstîyên taybetî yên jinan, li gel yên li ser girîngîya tevlêkirina jinan bo hemû tedbîrên domandina aşîyê û avakirina aşîyê pêşkêşî Dewletên Endam bike, Dewletên Endam vedixwîne ku van hêmanan li gel haydarîya bo HIV/AIDS têxin nav bernameyên perwerdeya karmendên leşkerî û sîvîl ku ji bo bicîhkirinê amade dibin, û *dîsa daxwaz dike* ku Sekreterê Giştî bicîh bike ku karmendên sîvîl ên operasyonên domandina aşîyê perwerdeya wek vê bibin;
7. *Bi xurtî doz dike* ku Dewletên Endam piştevanîya xwe ya dilxwazî bo hewlên perwerdeya bo cinsan bihîstyar, li gel ewên ku bi fon û programên eleqedar tîne meşandin, li gel yên din, Fona Neteweyên Yekbûyî bo Jinan û Fona Neteweyên Yekbûyî bo Zarokan, û ji alîyê Ofîsa Komîsyonerê Bilind ê Neteweyên Yekbûyî bo Penaberan û sazîyên din ên eleqedar ve, zêde bikin;

S/RES/1325 (2000)

8. *Bang li* hemû aktorên têkildar *dike* ku, di gotûbêjêkirin û bicîhkirina peymanên aşîyê de, perspektîveke cinsan ku li gel ên din evên jêrîn di nav de bin, bicîh bînin:

(a) Pêwîstîyên taybetî yê jin û keçan di dema li welatê xwe vegerandin û ji nuh de bicîhkirinê de û ji bo rehabîlîtasyon, ji nuh de întegrasyon û ji nuh de avakirina piştî nakokîyê;

(b) Tedbîrên ku piştevanîya însîyatîvên aşîyê yê jinên herêmê û pêvajoyên xwecîhî bo çareserîya nakokîyê bikin, û jinan tev li hemû mekanîzmayên bicîhkirina lihevkerîna aşîyê bikin;

(c) Tedbîrên ku parastin û rêzgirtina mafên mirovan bo jin û keçan bikin, bi taybetî ku bi qanûna bingeîn, sîstema hîlbijartinan, polîs û dadyarîyê têkildar bin;

9. *Bang li* hemû alîyên nakokîya çekdarî *dike* ku bi giştî rêzgirtina qanûna navneteweyî ya bo maf û parastina jin û keçan, bi taybetî yê sivîl, bikin; bi taybetî divêtîyên wan yê li gora Konvensiyonên Cenevre yê 1949an û Protokolên Zêdekirî yê 1977an, Konvensiyona Penaberan a 1951an û Protokola wê ya 1967an, Konvensiyona Rakirina Hemû Awayên Cûdagirtina li dijî Jinan a 1979an û Protokola wê ya Bijartekî ya 1999an û Konvensiyona Neteweyên Yekbûyî bo Mafên Zarokan a 1989an û her du Protokolên wê yê Bijartekî yê 25 Gulan 2000an bikin, û Şerd û Mercên Qanûna Romê ya Dadgeha Sûcên Navneteweyî bibîr bînin;

10. *Bang li* hemû alîyên nakokîya çekdarî *dike* ku ji bo parastina jin û keçan ji tundkarîya cinsî, bi taybetî destavêtin û awayên din ên xerabkarîya cinsî di rewşên nakokîya çekdarî de, tedbîrên taybetî bisitînin;

11. *Li ser* berpirsiyarîya hemû Dewletan *radiweste* ku dawî li bê ceza mayînê bînin û dozê li kesên ku ji qirkirin, sûcên li dijî mirovanîyê, û sûcên şer berpirsiyar in, vekin; ewên bi tundkarîya cinsî an wekî din li dijî jin û keçan jî di nav de, û bi vê re têkildar *li ser* pêwîstîya li cîhê mimkun li dervê şerd û mercên efûya giştî hiştina van sûcan *radiweste*;

12. *Bang li* hemû alîyên nakokîya çekdarî *dike* ku rêzdarîya karaktera sivîl û mirovanî ya kamp û wargehên penaberan bikin, û pêwîstîyên taybetî yê jin û keçan yê di nav dîzayna wan de li pêş çav bigirin, û biryarên xwe yê 1208 (1998) a 19 Mijdar 1998an û 1296 (2000) a 19 Nîsan 2000an bibîr tîne;

13. Hemû kesên ku tev li plansazîya bêçekkirin, betalkirina seferberîyê û ji nuh ve întegrasyonê bûne *teşwîk dike* ku pêwîstîyên cûda yê şervanên berê yê jin û mêr li pêş çav bigirin û pêgirtîyên wan jî bixin nav hesêb;

14. Amadebûna xwe *dîsa teyîd dike* ku kengî li gora Xal 41 a Peymana Neteweyên Yekbûyî tedbîr bîn sitendin, bandûra wan a potansiyel li nifûsa sivîl li pêş çav bigire, pêwîstîyên taybetî yê jin û keçan bibîr bîne ku muafbûnên minasib ên mirovanî li pêş çav bigire;

15. Xwestina xwe *tîne zimên* ku bicîh bike ku Konseya Ewlekarîyê cinsan li pêş çav bigire û mafên jinan têxe nav hesêb, rêya şewirdarîya bi komên jinan ên herêmî û yê navneteweyî re jî di nav de;

16. Sekreterê Giştî *vedixwîne* ku li ser bandûra nakokîya çekdarî li jin û keçan, rola jinan di domandina aşîyê de û alîyên cinsî di pêvajoyên aşîyê û çareserîya nakokîyê de lêkolînekê pêk bîne, û *dîsa wî vedixwîne* ku raporekê li ser encama nakokîya çekdarî li jin û keçan, rola jinan di avakirina aşîyê de û alîyên cinsî yê pêvajoyên aşîyê û çareserîya nakokîyê pêşkêş bike bo Konseya Ewlekarîyê û vê lêkolîne ji bo hemû Dewletên Endamên Neteweyên Yekbûyî peyde bike.

17. Ji Sekreterê Giştî *daxwaz dike* ku li cîhê minasib, pêşketina li ser tevlêkirina cinsan di mîsyonên domandina aşîyê de û hemû alîyên din ên bi jin û keçan têkildar têxe nav raporên xwe yê bo Konseya Ewlekarîyê;

18. *Biryar dide* ku bi awayekî çalak li mijarê xwedî derkeve.